*Gava ji kevnargeha Jeu de Paume derketim, min li daran dinêrî û ji nişka ve dîmeneke din hat ber çavên min; dar diguherîn, vediguherîn. Ew şev bi dijwarî derbas bû. Ji bo ku vegerim kevnargehê min sebir nedikir û ez lê hay dibûm ku ev tişt hatibû serê osteyên ku ez heyrana wan bûm; Rembrandt, Courbet û Velasquez jî. Heta wê demê min tenê tiştên xwiya dibûn zevt kiribûn û niha min tilîka xwe datanî ser "dinyaya din". Bi gotina Héraclite, min "dîmena nedîtbar" kişf kiribû û min berhemên osteyên din bi awayekî din didît. Min ji rêya xwe bawer kir; ji bo diyarbûna tiştên nayên dîtin, xwezaya ku destpêka ketina rê bû, diviya bi hestyarî bihata derbaskirin.*

*Jeu de Paume müzesinden çıktığım sırada ağaçlara bakıyordum ve birden gözlerimin önüne bir başka görüntü geldi: ağaçlar farkılılaşıyor, dönüşüyordu. O gece zor geçti. Müzeye geri dönmek için sabırsızlanıyor ve hayran olduğum ustaların, Rembrandt, Courbet ve Velásquez'in de aynı deneyimi yaşadıklarını fark ediyordum. O zamana kadar yalnızca görüneni yakalamıştım ve şimdi "öteki dünya"ya parmağımla dokunuyordum. İçlerinde, Héraclite'in deyimiyle "görünmez görüntü"yü keşfettiğim diğer ustaların eserlerine başka gözle bakıyordum. Kendi yolumdan emin oldum: Görünmeyenin ortaya çıkabilmesi için, başlangıç noktası olan doğa, duyguyla aşılmalıydı.*



Kantîn Kantin, 1964, Boyaxa Neftî Yağlıboya, 116x89 cm

1928 Remzi Raşa, li Qirikxaneya navçeya Antakyayê wekî lawê malbateke Kurd û dewlemend tê dinyayê. Bavê wî serokê eşîrê ye, ew berî ku Remzî bê dinyayê diya wî terk dike. Remzî emanetî malbeteke xizmê xwe dikin. Lawekî vê malbatê her tim wêneyan çêdike, Remzî bê monetan û acizî her tim li wî temaşe dike.

1937 Diya wî cardin dizewice, Remzî li cem diya xwe bi cî dibe. Bi zirbirayê xwe re seranserê salekê li Sûrî diçe dibistanekê. Di pirtûkên Frensî de reproduksiyonên hin tabloyan kişf dike. Di dersên wêneyê yên dibistana seretayî de, jîrtîya wî geş dibe.

1940 Diya wî qet guh nade Remzî, li cem bav û dêmarîya xwe bi cî dibe. Bi awayekî nîzamî dadikeve çarşiya Qirikxaneyê û çavdêriya gundiyan dike.

1941 Li Antakyayê dest bi dibistana seretayî dike û li wir kevnargeha mozaîkê wî sermest dike. Axê bi dohnê bizir û benzînê ron dike û hînî çêkirina boyaxa xwe dibe.

1944 Cara yekem tabloya xwe ya ji boyaxa neftê li ser qartonê çêdike, ev portreyeke hevalekî wî ye.

1946 Tevî ku bavê wî li dij derdikeve jî, diçe Stenbolê. Îmtihana beşa wêneyê ya Akademiya Hunerên Xweşik ya ku Leopold Levy rêvebiriya wê dike qezenc dike.. Atolyeya Bedri Rahmi Eyuboğlu hildibijêre. Heyranê Holbein û Durer e û amade ye ku bi wan re qayişê bikişîne.

1947 Li Qirikxane, Antakya û Îskenderûnê pêşangehên xwe yên destpêkê vedike. Mirovên ku çandinîyê dikin bi baldarî li wêneyên wî temaşe dikin, ev yek jî heweskarîya wî zêdetir dike.

1948 Bi hevalê xwe yê ji Antakyayê re li Wargeha Gel a Şîşlîyê wêneyên xwe pêşan dide.

1950-52 Tev li “Onlar Grubu” (“Grûba Wan”)ya ku xwendekarên atolyeya Bedri Rahmi damezirandibû dibe. Di her havînê de diçe Qirikxanê, di dema çinînê de dixebite, bi pereyê ku birayê wî didê perwerdeya xwe ya Hunerên Xweşik didomîne.

1953 Akademîyê diqedîne û diçe Parîsê. Xwe li Montparnasse, di nav dinyaya hunermendên wê demê yên bi dijberiyan tije de dibîne. Hin caran di avahîyan de wekî boyaxvan dixebite, debara xwe bi zor dike.

1955 Grawurên wî, li Parîsê di pêşangeheke grûbî ya li Galerie La Hune de cî digirin. Piştî salekê, galerîvanê bajêr yê herî awangard Iris Clert, Remzî dawetî pêşangeheke têkel dike. Li Galeriya Bajêr a ku li Stenbolê ye, pêşangehekê vedike û li Parîsê bi cî dibe. Careke din li Le Selectê, rastî Leopold Levy tê.

1960 Di gera Ceyreste ya li başûrê Frenseyê de hevaltiya Leopold Levy dike. Leopold Levy li ser tabloyên dîmenan dixebite, Remzî wêneyên însanan û “girtîgeha xwe” çêdike.

1965 Cara yekem ji bo ku biçe serlêdana Fikret Mualla çûbû taxa Alésiayê. Li atolyeya ku li Nabosa Alésiayê ye ya ku hîn jî bi kar tîne, bi cî dibe. Paşê bi qasî nîv sedsalî, li bajarên muhîm ên Frense, Îtalya, Swîsre û Almanyayê pêşangehan vedike. Berhemên wî li Musée du Montparnasse, Musée Carnavalet, Musée de Dourdan, Musée National de Laon ve Musée d’art moderne de la ville de Paris tên temsîlkirin.

# REMZİ RAŞA

## Hilbijartina Tenêtiyê Yalnızlığı Seçmek
## Retrospektîfek Bir Retrospektif: 1946 - 2006

DİYARBAKIR BÜYÜKŞEHİR BELEDİYESİ

ANADOLU KÜLTÜR

7 Nîsan Nisan - 6 Gulan Mayıs 2012
Vebûn Açılış: 7 Nîsan Nisan 2012
Saet Saat: 17:00
Cî Yer: Galeriya Hunerê ya Amedê, Sumerpark - Amed
Amed Sanat Galerisi, Sümerpark - Diyarbakır